KÜRT YAZARLAR DERNEĞİ
KOMELEYA NİVÎSKARÊN KURD
KURDİSH WRITERS' ASSOCİATİON
2004

JI RAYA GIŞTÎ Û ÇAPEMENIYÊ RE

Li Amed, Êlih, Stenbol û gelek ciyên din pîrozkirina Newrozê li gorî wateya xwe pêk hat, bi rengê cejnê derbas bû. Lê belê li hinek bajaran ji bo pîrozkirinê destûr nehat dayîn û bûyer derketin. Li Wanê, Sêrtê, Cûlemêrgê û Gewerê hêzên ewlekariyê bi awayê neyînî û tundiravî nêzikahî nîşandan û bûn sedema bûyeran.

Newroz roja mizgîna biharê ye û di vê rojê de şahî û govend li dar dikevin. Lê di vê rojê de ji şadiyê bêtir xwîn hatiye rijandin, gelek însan bi îşkence û lêdanê hatiye hilperandin. Di bûyeran de Li Sûriyeyê li bajarê kurda Qamişloyê 3 kurd; li Wanê Îkbal Yaşarê 20 salî; li Gewerê Zekî Erînçê 35 salî bi destê polîsan hatine kuştin. Ji 100 kesî zêdetir birîndar hene. Ji vana 30 kes bi guleyên polîsan birîndar bûne.

Bi guleyên rastîn û yên plastîk êrîşê girseyan hatiye kirin, yên ku hatine girtin bi îşkence û lêdanên kîndar hatine binçavkirin, mudaxeleyên ku hatine kirin jî bê şiyarî hatine kirin, li hember xwepêşandêran zor û lêdanek bêkontrol hatiye bikaranîn. Bi taybetî li Gewer û Wanê bi tevahî însiyatîf di destê hêzên ewlekariyê de maye. Ji bo ku bi riya aştiyê çareserî pêk bê parlamenterên DTP'ê ketine navberê, lê berpirsên hêzên ewlekariyê kesê guh nedaye wan. Kesên berpirs bi destê parlamenteran jî ne girtine. Bi awayekî tund û êrîşkar nêzikahî nîşan dane. Ev jî li hember çavê hemû dinyayê hatiye kirin.

Dibû ku wekî her sal îsal jî pîrozkirinên Newrozê bi awayekî xweş û bi rengê cejnê derbas bibûye. Her çi qas Wezareta Karên Hundirîn genelgeya "bila destûr bê dayîn" şadibe jî walî û gerînendeyên ewlekariyê bi awayekî bêberpirsiyarî destûr nedane û bûne sedemê bûyeran. Nêzikahiya bi vî rengî li gorî me watedar e!

Dixwazin çi bikin?

Hêzên ewlekariyê dema ku mudaxele kirine bi awayekî bêkontrol zor û lêdanê pêkanîne. Ev jî gelek dîmenên ne xweş û ku nayên qebûlkirin aniye meydanê. Ev nêzikahî bi xwe re hêrs û pefçûnan jî aniye.

Em wekî Komeleya Niviskarên Kurd vê rewşa hanê şermezar dikin û dibêjin ku bila berpirsên van bûyeran yên ku bi zor û lêdana bêkontrol bi ser gelê kurd de çûne bêne girtin û bêne darizandin.

Em dixwazin ku ew kesên ku hatine girtin bilez bêne berdan û walî û gerînendeyê ewlekariyê yên ku bûne sebebê kuştinan û birîndariyan di heman demê de ji peywirê bên bidûrxistin.

Her wiha em ji gelê kurd û lêzimên kesên ku jiyana xwe ji dest dane re sersaxî dixwazin, ji birîndaran re şafayê dixwazin û hêvî dikin ku gelê kurd careke din li hember bûyerên bi vî rengî rû bi rû nemîne. *26.03.2008*

Komeleya Niviskarên Kurd

Navnîşan: Huzurevleri Mah. Dr. Sıtkı Göral Caddesi
Kalem Sokak No: 32 K: 4
Kayapınar/Diyarbakır

WEB: www.kurtyazarlardernegi.org.tr
Tlf-Fax: 0090 0412 237 43 16
GSM: 0090 533 655 69 85
E-Mail: komeleyaniviskaran@yahoo.com
komeleyaniviskaran@hotmail.com

a_irba@yahoo.com